

## Dengê tepsiya şêx

Li Amedê Derwêş Sofî Kemal ku nêzî salan derwêşî dike, heta roja ku dibe mirîd û rêya derwêşiyê li ber vedibe jî diçe ber sewalan. Rojek dema ku şêxek tê gundê wan, xwe li dengê tepsiya ku şêx lê dide digire û êdî naçe be sewalan... RÛPEL - 6

# Li dijî kurdan konsepta nû




**BIRYARA** DYA'yê ya der barê 3 rêveberên PKK'ê de; versiyona polîtîkayên nû ya DYA û Ewropayê ya ku dibêjin ji Apo re 'Na' ji PKK'ê re 'Erê' ye. Komploya Navdewletî û konsepta niha bi vî awayî tê birêvebirin. Di nav vê konseptê de DYA û Ewropa jî hene. Helwesta YNK û KDP'ê jî dide xuyakirin ku ew jî perçeyên vê konseptê ne.

**KURD** êdî xwedî zanebûneke wisa ne ku bi gotin û lîstikên 'Mihemedê Kurd here nobetê' naxapin. YNK xizmeta polîtîkaya krîmînalîzekirina hêzên kurd ên demokratîk a dewleta tirk dike. Divê YNK dev ji nêzikatiyên xwe yên êrîşkar ên li dijî Tevgera Azadî, tevgera jinê û saziyên din ên demokratîk berde. Mirov ji ku dera zirarê vegere, kar e... Nivîsa Salih Cûma Pîr / R.3

@rojname

6 Kanûn - Pênçşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 196

## Mikurhatin dilsozî ye



Ne karekî hesan e! Bi temamî destan û efsûneyek e, bûye û dibe dîroka mirovahiyê. 40 sal e "Destarê vejîna jiyana nû" bi hemû zexmbûna xwe bê rawestan digere û berdewam e. Tu qeyd, bend û kelem nikarin xwe li ber rastiya vê felsefeya ku Rêber Apo afirandî ragirin. 40 sal e ji kîjan qonaxê heya ku derê? Bi civakî û bi neteweyî êdî me daye ser şopa venegerê... Nivîsa Xelîl Xemgîn / R.6

### DI KONFERANSA KURD DE REWŞA TIRKIYEYÊ HAT NIRXANDIN

# Tecrîd heye hiqûq tune



### REWŞA MAFÊ MIROVAN

**LI TIRKIYEYÊ** tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dike û li aliyê din li hemberî tecrîdê grevên birçîbûnê berbelav dibin. Li Parlamentoya Ewropayê 15'emîn Konferansa Kurd dest pê kir. Di konferansê de parêzvanên mafên mirovan axivîn. Nûnerên ÎHD'ê bal kişandin ser rewşa mafên mirovan a li Tirkiyeyê û diyar kirin ku li Tirkiyeyê hiqûq û destûra bingehîn nemaye.

### TECRÎDA LI ÎMRALIYÊ


**PARÊZERÊ** Ocalan Îbrahîm Bîlmez di konferansê de bal kişand ser rewşa Îmraliyê û da zanîn ku li Îmraliyê hiqûq tune ye û wiha got: "Ne mercên girtina Ocalan, ne jî dadgeha hate avakirin, ne adil û ne jî hiqûqî ye. Ocalan bi salan e nikare kesî bibîne. Li Îmraliyê tecrîdeke pir giran heye. Li Îmraliyê hiqûq nîne, bê hiqûqî heye. Eger wê rexne li Tirkiyeyê bên kirin, divê di wexta xwe de werin kirin... R - 3



## Qamişloyê piştgirî da Leyla Guven

Hevseroka KCD'ê Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 29 roj in di greva birçîbûnê de ye. Her wiha li seranserê cîhanê grevên li dijî tecrîdê dewam dikin.Ji bo piştgiriya greva birçîbûnê ya Leyla Guven, li bajarê Qamişloyê kon hate vedan. Di kon de, 70 kesan dest bi greva birçîbûnê kir... R.3

### Wekîlan li meclisê bang kir



Parlamenterên HDP'ê yên bi dirûşma 'daxwaza we daxwaza me ye' yên ji bo piştgiriya çalakiya Leyla Guven ketin greva birçîbûnê gotin: "Em ê bi ser bikevin. Em ê hemû tecrîdê bi hev re bişikînin." ... RÛPEL - 3

KIRMANCKÎ

**Yorukî waştî Demîrtaş bêro veradayîş** RÛPEL - 5

KIRMANCKÎ

**Ronîştişê doza Kîbriye Evrene ewro yo** RÛPEL - 5

CÎHAN

**Li Fransayê barkêş jî dikevin greva bê dawî** RÛPEL - 4

## Li Kobanê ji bo Ocalan mîtîng li dar xistin

Bi hezaran şêniyên Kobanê bi dirûşma "Em ê bi hev re tecrîdê bişikînin, dîktatoriyê hilweşînin û neteweya demokratîk ava bikin" li Qada Jinên Azad kom bûn. Di mîtîngê de ji rêveberên PYD'ê Eyşe Efendî axivî û destnîşan kir ku rêberekî wekî Ocalan di girtîgehê de ye û helwesta hêzên navneteweyî rexne kir. R.3






## Kevir jî binçav kirin

Li taxa Mezra ya Erdîşa Wanê leşkeran avêt ser mala Cemal Yildiz û ew binçav kirin. Leşkeran avêt ser goristana li gund jî û kêlika gora kurê Yildiz, Harûn Yildiz ê HPG'î bi xwe re birin... RÛPEL - 3

www.arsivakurd.org



## Şandeyeke jinên alman serdana Reqqayê kir

*REQQA* - Şandeyeke jinên alman serdana Mala Jinan a bajarê Reqqayê kir da ku rewşa jinan piştî ku bajarê Reqqayê ji çeteyên DAIŞ`ê hate rizgarkirin û asta ku jin gihîştinê bibînin. Piştre şande li bajarê Reqqayê geriya, serdana meclisên herêmî kir û venêrîna rewşa jinan û çawaniya birêxistinkirin û birêvebirina wan kirin. Şandeyê tekez kir ku tiştên ku wan dîtiye, ne wekî ku hinek dezgehên çapemeniyê îdia dikin ku jin di bin zilm û zorê de ne. Her wiha destnîşan kirin, wan dîtiye ku çawa jinên Reqqayê rola xwe di hemû saziyan de dilîzin.

# Gund jêderka çand û dîrokê ne

Jina bi navê Yazi Mela Îsa bi bikaranîna alavên kevn çanda xwe zindî dihêle. Îsa diyar kir ku gund jêderka çand û dîrokê ye û destnîşan kir ku divê ew alavên dîrokî biparêzin da ku çand neyê jibîrkirin




Li gundê Şûniyê yê bajarê Til Temir ê kantona Hesekê Yazi Mela Îsa ya 85 salî bi xebitandina alavên dîrokî çanda kevnar a dayika xwe diparêze û bi bikaranîna van alavên dîrokî bîra civakî zindî dike.

Der barê bikaranîna alavên dîrokî de Îsa diyar kir ku ji bo nirxên civakî bên parastin pêdivî bi xwedîderketina çandê heye û wiha got: "Ez ji ber ku ji alavên dîrokî hez dikim û naxwazim ev çand bi dawî bibe, bi kar tînim. Dixwazim hemû kes vê çandê bizanibin û xwedî lê derkevin."

Dayika Yazi da zanîn ji ber ku zarokatiya wê li gund derbas bûye ew xwe gelek bi şans dibîne û wiha domand: "Dema ku ez zarok bûm derfeta min çênebû ku ez biçim dibistanê. Li mal ez bi alavên dîrokî re mijûl dibûm û ev 85 sal in ku ez wan bi kar tînim. Gelek kes nizanin bi kar bînin û ev yek jî êdî dibe sedema windabûna çanda kevnar. Lê ez dixwazim her dem çanda kevnar bidome."

Di axaftina xwe de dayikê bal kişand ser girîngiya gundan a di nava dîrokê de û destnîşan kir ku gund jêderka çand û dîrokê ye û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Li gundan hemû çand hîn zindî ye. Dema em alavên dîrokî bi kar tînin em stranan jî li ser dibêjin û bi vê yekê em xwedî li gotinên xwe jî derdikevin. Dema ku ez alavên dîrokî yên wekî hawan, destar, cuhnî bi kar tînim zarokatiya min tê bîramin. Divê alavên xwe yên dîrokî em biparêzin da ku em çanda xwe ji bîr nekin." *HESEKÊ*



## Li Îsraîlê jin daketin qadan û tundî şermezar kir

Li paytext Tel Avîv a Îsraîlê bi dehhezaran jin li dijî polîtîkayên tundiyê ya hikûmetê li hemberî jinan daketin qadan.

Jin ji ber neastengkirina kuştina jinan a ji aliyê hikûmetê û qanûnên kêm, serokwezîrê Îsraîlê Benyamîn Netenyahu protesto kir û dirûşmên wek 'Bîbî (bernavka Netenyahû ye) şiyar bibe. Xwîna me ne erzan e' û 'Em tên kuştin û hikûmet bêdeng e' berz kirin. Jin li Qada Habîma 200 pêlavên ku bi rengên sor hatibûn sorkirin û tundiya li ser jinan sembol dikir, rêz kirin. Çalakvanên jin wêneyên jinên ku li Qudsê hatibûn kuştin jî hildan û li ser kolanan boyaxa sor rijandin.

**Divê proje bikevin meriyetê**

Her wiha rêxistinên ku protestoyan organîze dikin ji hikûmetê xwestin ku plana 59 milyon euro ya ji bo têkoşîna tundiya li hemberî jinan ku sala borî aşkera kiribûn, bixin meriyetê.

Hêjayî gotinê ye li Îsraîlê hefta borî 2 jin hatin kuştin û bi ev kuştina 2 jinan re li Îsraîlê hejmara jinên ku di nava salekê de hatin kuştin derket 24'an. *TEL AVÎV*

## Celaliyan: Li parêzeran xwedî derkevin

Parêzerê girtiya siyasî ya kurd Zeyneb Celaliyan, Emîr Salar Dawidî ji aliyê hêzên Îtlaata Îranê ve hat girtin û ew şandin girtîgeha Evîn a Tehranê. Hêzên Îtlaatê li mal û navenda karê Dawidî lêgerîn kiriye û dest danîne li ser gelek dosyayên giliyan.

Girtiya kurd Zeyneb Celaliyan ku 11 sal e girtî ye, li ser binçavkirina parêzerê xwe nameyek vekirî şand û bang li Rêxistina Mafên Mirovan û Sendîkaya Parêzeran kir. Celaliyan di nameya xwe de wiha got: "Divê bi her awayî hewl bidin da ku ev parêzerê parastina mafên mirovan dike, serbest were berdan. Nabe ku kesek ji bo azadî û hevkariya hinek din hewl dide, weke tawanbar were girtin. Ger hûn destûr bidin kesên weke Emîr tawanbar werin dîtin û li beramberî vê bêdeng bimînin, wê yên din jî li helwesta we binihêrin û wê kesek din ji bo parastina mafên kesên din erk negirin."

Her wiha parêzer Emîr Salar (37) parêzereki xwebexş yê îranî ye û heta niha parêzeriya gelek zindaniyên siyasî yên Îranê kiriye. *SILÊMANÎ*



## Li Tirkiyeyê mafên jinan tenê li ser qaxizê in

5'ê Kanûnê Roja Mafên Jinan ji bo pirsgirêkên jinan bikevin rojevê û der barê mijarê de cudahiyek pêk were û ji bo çareseriyan girîng e. Li Tirkiyeyê jî di 5'ê Kanûna 1934'an jin bûn xwediyê mafên hilbijartinê û di 1935'an de 18 parlamenter hatin hilbijartin. Ji wê rojê heta niha 5'ê Kanûnê li Tirkiyeyê wekî "5'ê Kanûnê Roja Mafên Jinan" tê qebûlkirin.

Endama Platforma Hiqûqnasên Azad (OHP) û endma Komisyona Mafên Jinan a Buroya Wanê Parêzer Dîlan Kunt Ayan der barê mafên jinan û êrîşên li ser mafên jinan nirxandin kir.

**'Em ê bi hemû hêza xwe têbikoşin'**

Ayan diyar kir ku bi salan e li dijî mafên jinan êrîşên mezin pêk tên û wiha got: "Zagona 6284'an ji bo parastina mafên jinan girîng e û lê di demên dawî de êrîşên mezin li dijî vê zagonê hene. Di pêvajoya herî dawî de nafaka jî di rojevê de cihekî girîng girt. Em ê mafên xwe yên ku me qezenc kirine nedin tu kesekî. Mafên jinê tenê li ser qaxiz tên hiştin. Mafên jinan ên parastinê ji destên wan tên standin. Divê jin li hemberî êrîşên li dijî mafên jinan bi hemû hêza xwe bixebitin û têbikoşin. Divê em zagona xwe ya 6284'an a herî xurt dîtbar bikin. Dema ku qeyûm hat tayînkirin hemû saziyên jinan hatin girtin. Ji bo mafên jinan bi wan bide naskirin û biparêzin divê em hemû bi hev re têbikoşin."

**Hedefa yekem parastina jinan e**

Ayan anî ziman ku êrîşên li dijî maf û destkeftiyên jinan didomin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Heta 5'ê Kanûna sala bê hedefa me ya yekem parastina mafên jinan e. Em qebûl nakin ku mafên jinan ên ku hatine bidestxistin tenê li ser qaxizê bimînin. Em ê heta dawiyê mafên jinan biparêzin." *WAN*

## Lazim e jin destpêkê ji xwe bawer bin



Partiyan ji bo hilbijartinên herêmî ku dê di 31'ê adara 2019'an de pêk werin xebatên xwe yên ji bo diyarkirina namzetan didomînin. Ji bo keyatiyê jî serlêdan didomin. Jinên Dêrsimê jî ji bo keyatiyê serî lê didin. Şîlan Aslan jî niha ji bo keyatiya gundê Buzlutepeya Pulurê ya Dêrsimê serî lê da.

Der barê mijarê de Aslan da zanîn ku dema ew bibe keya ew dixwaze herî zêde der barê jin û zarokan de xebatan bike û wiha got: "Min li lîseya pîşeyê xwend. Min beşa perwerdikirina zarokan qedandiye. Li vir jin ji ber kar û barên xwe zêde demê nikarin ji zarokên xwe re veqetînin. Loma ez ê hewl bidim ku derfetan ava bikim ku jin û zarok bi hev re demê bikaribin derbas bikin. Berê jinan nedixwest ez ji bo keyatiyê bibim namzet. Ez dixwazim hişmendiyê bidim qezenckirin. Divê em jin berê ji xwe bawer bin. Dema em vê yekê bizanibin û em wiha tev bigerin em ê mecbûrî tu kesî nebin." *DÊRSIM*

## Di mijdarê de 16 jin hatin kuştin

Li Tirkiyeyê li dijî tundî û kuştina jinan, êrîşa li dijî zarokan û mirina zarokan tu qanûn nehatine çêkirin û cezayên ku li hemberî sûc bibin asteng nehatine dayîn. Zîhniyeta ku nikare tehamûlî dengê jinan jî bike di meha mijdarê de bû sedema kuştina gelek jinan. Platforma Em ê Kuştina Jinan Rawestînin ragihand ku di meha mijadarê de 16 jin hatine qetilkirin û 8 jin jî bi tundiyê re rû bir mane, her wiha 12 zarok jî rastî êrîşa zayendî hatine û li 2 zarokan jî tundî hatiye kirin. *AMED*

## Divê ji bo lêkolînê destûr bê dayîn

Parêzera Komîsyona Zarokan a Baroya Aydinê Cennet Ceyda Boga ku li ser tedbîrên alternatîf ên mayîna di girtîgehê de û dicihdebûn an jî nedicihdebûna ceza de nirxandin kir, rewşa jinên girtî û bandora girtina demdirêj vegot. Boga ya ku zarokên li girtîgehan bi dayikên xwe re dimînin û jinên ducanî bi bîr xistin, diyar kir ku di berdêla hepskirinê de divê alternatîf bên pêşxistin û wiha got: "Divê ji bo ku rewşa jinên ducanî bê lêkolînkirin ji civaka sivîl re destûr bê dayîn." *STENBOL*



www.arsivakurd.org



SALIH CUMA PÎR

# Ji Îmaraliyê re 'Na', ji PYD-HDP-PJAK'ê re 'Erê'

Biryara DYA'yê ya der barê 3 rêveberên PKK'ê de; versiyona polîtîkayên nû ya DYA û Ewropayê ya ku dibêjin ji Apo re 'Na' ji PKK'ê re 'Erê' ye. Ev nêzîkatiya niha ji Apo û PKK'ê re 'Na' lê ji PYD, HDP û PJAK'a ku li ser bingeha têkoşîna wan derketine holê re bûye 'Erê'. Bala xwe bindinê PYD, HDP û PJAK tên pejirandin lê Tevgera ku bi ramanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve girêdayî ye jî nayê pejirandin. Komploya Navdewletî û kospeta niha bi vî awayî tê birêvebirin. Di nav vê konseptê de DYA û Ewropa jî hene. Helwesta YNK û KDP'ê jî dide xuyakirin ku ew jî perçeyên vê konseptê ne. Ango nêzîkatiyek wiha ye ku dixwazin destkeftiyên bi têkoşîna PKK'ê derketine holê bi dest bixin. Ger em bi van hûrgiliyan nizanibin jî çaroveya komploya navdewletî ya giştî bi vî rengî ye.

Rayedarên DYA'ê li gelek cihan dibêjin ku ew ê bandora PKK'ê ya li Rojava û Sûriyeyê bişikînin. Û xuya dibe ku vê bandorê gav bi gav li Bakur, Rojava û Rojhilat jî dixwaze têxe pratîkê. Geşedanên siyasî yên dawîn vê rewşê nîşan didin. Wisa xuya dibe ku DYA li Sûriyeyê metirsiya tirk wek darê zorê bi kar tîne. Çavgirtina li êrîşên dewleta tirk ên destpêkê û piştre avêtina dewriyeyan û anîna rojevê ya avakirina nuqteyên çavdêriyê vê rastiyê radixe ber çavan. Nêzîkatiyên DYA'ê yên dawîn ên li Sûriye û Rojhilata Navîn bi êrîşên li hemberî dinamîkên demokrasiyê xwe didin der. DYA di heman demê de hevkariyê bi hêzên dijminê demokrasiyê yên mîna Tirkiyeyê re hevkariya dike. Ev polîtîka tenê bi Rojava û Sûriyeyê sînordar jî nîne. Li bakurê Kurdistanê jî hewldanên bi vî rengî hene. Dixwazin bidin nîşandan wek ku Îmaralî û PKK ya ku herî zêde ji bo pêşketina demokrasiya li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê têdikoşin, demokrasiyê naxwazin. Ev hêzên ku nikarin bi ser polîtîkayên faşîzma AKP-MHP'ê de herin, dixwazin hêzên kurd ên azadîxwaz ên li Bakur û Rojava bêçalak bikin û li ser vê bingehê armanc dike ku Tirkiyeyê jî ji bo polîtîkayên xwe yên li Rojhilata Navîn bi kar bîne. Dixwaze vê jî bi fedakirina kurdan pêk bîne.

Dinamika herî bihêz a demokrasiyê ya li Rojhilata Navîn, bi feraseta neteweya demokratîk û paradîgmaya azadiya jinê û civaka ekolojîk û demokratîk a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hatiye afirandin. Gelê kurd di demokratîkbûna Rojhilata Navîn de rola pêşeng dilîze. Hêza ku diguherîne û vediguherîne jî kurd in. DYA vê hêzê li Rojhilata Navîn ne ji bo demokratîkkirinê, dixwaze ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne. Ji ber vê yekê jî ji Îmralî û PKK'ê re dibêje na lê ji hêza civakî û siyasî ya ku afirandî re dibêje erê. Bi vê re jî dixwazin li ser PKK'ê komployeke nû pêk bînin. Divê tu kes saf nebe û divê van rastiyan bibîne. Divê firsetê nedin tu kesî ku ev destkeftî û hêza ku di encama berdêlên giran de hatine bidestxistin, bi awayekî bêserûber bên talankirin. Ji ber ku êrîşeke wiha ya li dijî PKK'ê, li dijî hemû kurdan e.

Bêbandorkirina Tevgerê ya li Başûr jî divê weke perçeyekî vê planê bê dîtin. YNK çiqas di ferqa vê planê de ye nayê zanîn lê qedexeya li ser Tevgerê di xizmeta vê komployê de ye. Ger ku ev plan bi ser keve, ya ku herî zêde dê zirarê bibîne jî dê YNK be. Ger ku YNK bi dûrbînane û berfireh li mijarê binihêre, dê bibîne ku di dawiya vê planê de ya ku dê zirarê bibîne, ew bi xwe be. PKK bi hêz û tecrûbeya xwe ya 45 salan, dê van astengiyan careke din derbas bike. Weke hêzeke berxwedêr, dê van êrîşan teqez berteref bike. Li dijî vê konseptê dê bêteredût têbikoşe. Dê derfet ji hewldanên hin derdorên ku dixwazin têkoşîna gelê kurd û Tevgera Azadiyê sist bikin re neyê dayîn. Tu xêr di plana DYA'yê ya ji bo kurdan de nîne. Di sala 1999'an de hin xafil û xayînên ku di gotin, 'piştî derbaskirina astengiya Rêber Apo dê pirsgirêka kurd çareser bibe' hebûn. Niha jî kesên wiha derketine. Ev polîtîka, bi temamî ji bo xapandina gelê kurd tên meşandin. Hem kurdên li her çar parçeyên Kurdistanê û hem jî siyasetmedarên kurd ji van polîtîkayan êdî haydar in. Ne PYD, ne PJAK û ne jî HDP êdî nayên van lîstikan. Berevajî vê, dê li çavkanî û dînamîkên ku jê hêz digirin bêhtir xwedî derkevin û têkoşîna jiyana demokratîk pêş bixin. Kurd êdî xwedî zanebûneke wisa ne ku bi gotin û lîstikên 'Mihemede Kurd here nobetê' naxapin.

Qedexeya YNK'ê ya li ser Tevgerê û êrîşên wê yên li dijî komeleyên jinan, di esasê xwe de berdewamiya êrîşên li dijî HDP'ê yên li Bakur in. Ji ber ku dewleta tirk vê yekê dixwaze. Tayyîp Erdogan her roj di got; 'li ku derê bin em ê êrîşî wan bikin.' Yên ku êrîşî DBP û HDP'ê dikin bêguman dê êrîşî PYD, PJAK û Tevgerê jî bike û li dijî wan dijminatiyê bikin. Herî dawî gotina konsolosê tirk ê Hewlêrê ku ji bo Tevgerê di got 'terorîst e', vê rastiyê radixe berçavan. YNK'ê di bereya xwe ve, xizmeta polîtîkaya krîminalîzekirina hêzên kurd ên demokratîk a dewleta tirk kiriye. Di vê çarçoveyê de jî divê YNK dev ji nêzîkatiya xwe ya êrîşkar a li dijî Tevger, tevgera jinê û saziyên din ên demokratîk berde. Mirov ji ku dera zirarê vegere, kar e.

# Li Ewropayê tecrîd hat nîqaşkirin

Bi tevlêbûna gelek nivîskar û parezvanên mafên mirovan li PE'yê 15'emîn Konferansa Kurd hat lidarxistin. Di konferansê de binpêkirinên li Tirkiyeyê û tecrîda li ser Ocalan hat nirxandin

Konferansa 15'emîn a Kurd ya li Parlementoya Ewropayê (PE) ku bi pêşengiya Komîsyona Hemwelatiyan a Tirkiyeyê ya Yekitiya Ewropayê (EÛTCC), Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK), Enstîtuya Kurdan a Brukselê û KURD-AKAD'ê hatiye organîzekirin, bi tevlêbûna beşdarên weke xwediyê xelata aştiyê ya nobelê Serpîskopos Desmond Tûtû, xwediya xelata aştiyê ya Nobelê Şîrîn Abadî, nivîskar Prof. Noam Chomsky û gelek Çepgirên Yekbûyî ya Ewropayê/Keskên Bakur (GÛE/NGL), Tifaqa Pêşverû Sosyalîst û Demokrat (S&D) hat lidarxistin.

Di konferansê de seroka Komîsyona EÛTCC'yê Kariane Westrehîm der barê konferansê de agahî da û wiha got: "Em ê vê carê li aktorên kurd binihêrin, krîzên li Tirkiyeyê nîqaş bikin û li rêyên çareseriyê binihêrin. Êdî bawerî bi Tirkiyeyê nayê. Divê li herêmê piştgirî ji kurdan re bê dayîn." Westrheîm her wiha parlementera HDP'ê Leyla Guven û çalakvanên din û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, silav kirin.

Endama Koma Tifaqa Azad a Ewropayê/Koma Keskan a PE'yê ya ji herêma Galîçyayê ya Îspanyayê Ana Mîranda jî daxuyand ku ew dê doza kurdan biparêzin û di meha kanûnê de li Enqereyê bi HDP'ê re bicivin.

**Pergala li rojavayê Kurdistanê**

Mêvana rûmetê ya konferansê û dosta kurdan a 20 salan parêzerê mafên mirovan ê ji Keyîtiya Yekbûyî Margaret Owen jî di konferansê de axivî û got ku Tirkiye ketiye bin rêveberiyeke nijadperest û diyar kir ku Erdogan hewl dide mafên mirovan û demokrasiyê bide jibîrkirin û wiha derbirî: "Tirkiye li Sûriye û Efrînê sûcê şer dike. Di vê êrîşê de hikûmeta îngilîz jî bi dewleta tirk re bû." Owen destnîşan kir ku Rojava ji bo çareseriyê mînakeke alternatîf e û bang li hêzên navneteweyî kir ku pişta kurdan bigirin û Tirkiyeyê ji NATO'yê derxînin.

**Pirsgirêk bûye ya cîhanê**

Parêzvanê mafên mirovan Akin Bîrdal, hevseroka Şaxa Stenbolê ya ÎHD'ê Gulseren Yolerî, parêzerê Ocalan Îbrahîm Bîlmez, sekreterê giştî yê Yekitiya Hiqûqnasên Demokrasî û Mafên Mirovan a Ewropayê Thomas Schmîdt, sekreterê giştî yê Dadgeha Gel a Daîmî Giannî Tognonî jî di panelê de axivîn.

Akin Bîrdal ku moderatoriya konferansê kir bal kişand ser rewşa mafên mirovan a li Tirkiyeyê û cîhanê û wiha got: "Pirsgirêka kurd pirsgirêkeke ku li cih dikarîbû bihata çareserkirin. Lê ji ber neçareserkirinê, veguherî pirsgirêkeke navneteweyî."

Di konferansê de Gulseren Yolerî jî li lêv kir ku li Tirkiyeyê her tim îşkence hebû lê niha girantir bûye û got ku li Tirkiyeyê destûra bingehîn teviziye.

**'CPT çima naçe Îmraliyê'**

Piştre jî Ozturk Turkdogan bi gotina 'Berxwedana li dijî zilmê, maf e' dest bi axaftina xwe kir û wiha got: "Rewşa tecrîdê ya li Îmraliyê li temamiya Tirkiyeyê belav bûye. Tecrîda li ser Ocalan, ji tecrîdê wêdetir e. Ger ku li welatekî parlamenterek ji ber bêhiqûqiyê bikeve greva birçîbûnê, êdî gotineke ku bê kirin namîne. Gelo çima CPT naçe Îmraliyê? Ger pirsgirêka li Îmraliyê neyê çareserkirin, ya girtîgehan jî çareser nabe."

**'Li Îmraliyê her tişt nebaş dibe'**

Parêzerê Ocalan, Îbrahîm Bîlmez jî ev tişt anî ziman: "Tirkiye êdî dewleteke hiqûqî û qanûnî nîne. Geşedanên niha hemû bi rewşa Ocalan ve girêdayî ne. Bêhiqûqiya li Îmraliyê bi komploya 1999'an dest pê kir. Ocalan bi salan e nikare kesekî bibîne. Li Îmraliyê tecrîdeke giran heye. Em dixwazin ku saziyên Ewropayê bi wêrekî tevbigerin."

Sekreterê Giştî yê ELDH'ê Thomas Schmîdt ji Erdogan weke 'dîktator' pênase kir û diyar kir ku divê xweseriya kurdan bê naskirin. *BRUKSEL*





# Polîsan kêlikê gorê jî binçav kir

Li taxa Mezra ya Erdîşa Wanê leşkeran di 21'ê mijdara 2018'an de avêt ser mala Cemal Yildiz ê 68 salî û ew binçav kir. Di heman demê de leşkeran avêt ser goristana li gund jî û kêlikê gora kurê Yildiz, Harûn Yildiz ê HPG'î yê di 21'ê hezîrana 2014'an de li navçeya Serêkaniyê ya Rihayê şehîd bû jî rakirin û bi xwe re birin.

Di avêtina ser malê de bav Yildiz bi hinceta li ser kêlika gora kurê xwe 'Şehîd' nivîsandiye û 'sembola PKK'ê' daye çêkirin hat binçavkirin. Bav di heman rojê de li Dadgeriya Cezayê Sulhê ya Erdîşê hat darizandin û bi îdiaya 'propagandaya rêxistinê kiriye' hat girtin. Her wiha kêlika gora kurê Yildiz jî şandin emaneta edlî.

Her wiha piştî kêlikê gora Yildiz hat binçavkirin, tenê li dora gorê çarçoveya mermerkirî ma. *WAN*

# 'Daxwaza Guven daxwaza gelê kurd e'

Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev 29 roj in li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê di çalakiya greva birçîbûnê de ye. Bi heman daxwazê girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne jî 10 roj in di çalakiya greva birçîbûnê de ne.

Her wiha li gelek bajaran parlamenterên HDP'ê ji bo piştgirîdayîna Guven û şikandina tecrîdê ketine çalakiya greva birçîbûnê. Li Êlih, Amed, Riha, Mêrdîn û Stenbolê parlamenterên HDP'ê yên di çalakiyê de der barê çalakiyê de axivîn.

Parlamenterên ku bi dirûşma 'Daxwaza Guven daxwaza me ye' ketine grevê, diyar kirin ku ya wan bibe serkeftinê berxwedan e û gotin ku dê hemû bi hev re tecrîdê bişikînin.

Li aliyê din 10 parlamenterên HDP'ê ku bi heman armancê li meclisê ketine greva birçîbûnê jî dan zanîn ku ew li dijî tecrîdê bêdeng namînin û dê bi çalakiyên xwe bibin dengê Leyla Guven. *AMED*

# Gel li dijî tecrîdê daket qadan

Bi pêşengiya Meclisa Saziya Malbatên Şehîdan bi dirûşma 'Tecrîdê bişkînin faşîzmê hilweşînin Kurdistanê azad bikin' bi sedan şêniyên Kantona Kobanê, endamên sazî û dezgehan meş li dar xist. Meşê ji Qada Jina Azad dest pê kir û heta Qada Şehîd Egîd dewam kir. Piştî deqeyek rêzgirtin axaftin hatin kirin. Di axaftinan de hat gotin ku tecrîd sûcê mirovahiyê ye û xwestin demildest tecrîd bê rakirin.

Bi heman armancî li taxa Xerbî ya Qamişloyê bi pêşengiya PYD û Kongreya Star bi dirûşma 'Tecrîdê bişikînin faşîzmê têk bibin bi Rêber Apo re azad bijîn' kona greva birçîbûnê hat vedan. Her wiha piştî Qamişloyê dê çalakiyên greva birçîbûnê li bajarên herêma Cizîrê bidomin. *KOBANÊ - QAMIŞLO*






# Li sê welatan grevên birçîbûnê

Grevên birçîbûnê yên li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan zêde dibin. Piştî ku hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven dest bi greva birçîbûnê kir, ev çalakî li Ewropayê jî belav bû.

Li paytexta Îtalya Romayê, koma ji 25 kesî ya ku li dijî tecrîdê ketiye greva birçîbûnê, li Piazza Dell Popolo daxuyanî da çapemeniyê. Piştî daxuyaniyê têkildarî tecrîdê balavok hatin belavkirin.

Greva birçîbûnê ya li bajarê Den Haag ê Hollandayê ev 6 roj e didome. Di çalakiyê de hevserokê DEMNED'ê Engîn Yûrtsever got ku heta tecrîd bi şikandin dê çalakiyên xwe bidomînin.

Her wiha greva birçîbûnê ya li bajarê Hildesheîm ê Almanyayê jî di roja 4'emîn de didome. Çalakî bi dirûşma 'Daxwaza Leyla Guven daxwaza me ye, daxwaza bi milyonan welatiyên kurd e, vê qîrînê bibihîzin' li avahiya Dîe Lînke (Partiya Çep) pêk tê. *BRUKSEL*



## Aliyên dijber ên Yemenê berê xwe dan Swêdê

**SANA -** Berpirsekî Yemenê ji ajansa Reutersê re diyar kir ku şandeya ku nûnertiya hikûmeta serokê Yemenê Ebid Rebo Mensûr Hadî dike, ji Erebistana Siûdî ji bo ku beşdarî danûstandinan bibe, derket. Şandeya hûsiyan jî bi balafireke Kuweytê û bi sefîrê Kuweytê yê li Yemenê Fehid Mîi û nûnerê navneteweyî Martin Griffiths re berê xwe da Stockholmê. Griffiths misogeriya vegerê jî da. Ji dêvla ku 12 kes ji şandeya hûsiyan biçûna danûstandinan, ji ber ku di navbera wan bi xwe de lihevkirin tune pêk nehatiye, 8 kes çûn. Mijara danûstandinan dê ji bo damezirandina hikûmeta derbasdar bibe.

# Jin li Hindistanê nîqaşên çareseriyê kirin

Li bajarê Bangalore yê Hindistanê komxebateke navneteweyî hate lidarxistin û perspektîfên rizgariya jinê hatin nîqaşkirin. Komxebat diyarî Sakîne Cansiz û Gaûrî Lankesh ku par li Hindistanê ji aliyê faşîstan ve hate kuştin, hate kirin




Li bajarê Bangalore yê li başûrê Hindistanê, nêzî 200 jinên ji 16 welatan li hev civiyan û di mijara rizgariya jinê de 3 rojan tecrûbeyên xwe yên têkoşînê û perspektîfên îdeolojîk parve kirin. Komxebat di çarçoveya biryara 2. Konferansa Jinên Cîhanê de pêk hat ku sala 2016'an li Nepalê li dar ketibû. Komxebat diyarî yek ji şehîdên pêşeng ên Tevgera Azadiyê ya Kurd Sakîne Cansiz û Gaûrî Lankesh ku par li Hindistanê ji aliyê faşîstan ve hate kuştin, hate kirin.

Komxebat ji aliyê pêkhateyên Konferansa Cîhanê ya Jinan a Jêrdest ve hate organîzekirin û di her roja konferansê de bi rengê komî nîqaş hatin kirin. Pêşkêşiya roja destpêkê ya komxebatê ji aliyê sekretera giştî ya Rêxistina Jinên Şoreşger a Hindistanê (AIRWO) Sharmîtstha Choûdhûry ve hate kirin. Choûdhûry diyar kir ku êrîşên li dijî jinan ên vê serdemê gihîştine asta epîdemiyê, lê ji her demê bêhtir jin têdikoşin. Choûdhûry anî ziman, divê ku tundiya li jinê ji mercên giştî cuda neyê nirxandin û pirsa 'tundî çi ye?' bikin. Divê em li ser vê hûr bibin.

Choûdhûry ragihand ku azadiya jinê bi cihê wê yê li nava hilberîna civakî ve girêdayî ye û got, divê tevgera jinê bi tevgerên çep, demokratîk û şoreşger re pêwendîdar bin. Choûdhûry bi dewamî diyar kir, divê ku jin femînîzmê bixin nava hemû rêxistinên çep û anî ziman ku rizgariya jinê û çînî pêvajoyên diyalektîk in û rêxistinên jinan ên serbixwexweser gelekî girîng in.

**'Afirîner Abdullah Ocalan e'**

Di roja duyemîn a komxebatê de qala tecrûbeyên têkoşînê û tespîtên îdeolojîk ên Tevgera Azadiyê ya Jinên Kurdistanê hate kirin. Nûnera REPAK'ê Meral Çîçek û ji Nûnertiya Tevgera Jinên Kurd a Navneteweyî Dilar Dîrîk li ser vê mijarê pêşkêşî kirin. Nûneran qala cihê Sakîne Cansiz ê di nav têkoşîna azadiyê ya jinên kurd kirin. Çîçek û Dîrîk diyar kir ku Tevgera Azadiyê ya Kurd pirsgirêka zayendê weke pirsgirêka duyemîn nabîne, weke pirsgirêka sereke dibîne gotin, afirînerê karê azadiya jinên Kurdistanê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Nûnerên Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê bi mînakan bal kişandin ser girîngiya têkoşîna çînî û zayendî ya radîkal a di nav tevgerên şoreşger û ragihandin, ji bo têkoşîneke xurt a rizgariya jinê, divê baviksalarî weke sîstemekê bê analîzkirin.

**'Em ji tevgera kurd hîn bibin'**

Jinên bi taybetî ji parzemînên Afrîka û Asyayê tev li komxebatê bûn, diyar kirin ku ew dikarin ji Tevger Azadiyê ya Jinên Kurdistanê gelek tiştan hîn bibin û hin pirs kirin. Jinên ji Almanyayê tev li bûn, bal kişandin ser girîngî û wateya têkoşîna jinên kurd û gotin ku dijminê bingehîn baviksalarî nîne, lê emperyalîzm e.

Komxebata bi stranên jinên şoreşger û berxwedana Rojava qediya. ***BANGALORE***

# Li Fransayê greva 'Êlek Zer'an berfireh dibe




Sozên ku hikûmeta Fransayê ji bo pêşîgirtina li çalakiyên 'Êlek Zer'an hatin dayîn, kesî razî nekirin. Di rewşeke wiha de, xebatkarên di barkêşiya rêyên bejahiyê de dixebitin, biryara ketina grevê da.

Çalakiya 'Êlek Zer'an ku 17'ê mijdarê ji bo şermezarkirina zêdebûna bihayê sotemeniyê dest pê kir û piştre veguherî çalakiyên ji bo parastina mafên xizanan, tevî sozên hikûmetê jî, xuya ye wê bidome. Tê payîn ku dê 'Êlek Zer' roja şemiyê careke din li gelemperiya Fransayê dakevin qadan. Xebatkarên sektora barkêşiyê jî dest bi greva bê dawî dikin.

Yek ji sendîkayên sereke yên çep ên li welêt CGT û FO daxuyanî dan û diyar kirin ku li dijî xespkirina mûçeyên ajokarên rêyên bejahî, ji şeva yekşemê saet di 22'an de û pê ve wê bikevin greva bê dawî. Sala 2016'an bi rêya biryarnameyekê hatibû ragihandin ku heqê saetên zêde yên ajokarên barkêşiya bejahî, wê ji 25 heta ji sedî 50 bê zêdekirin lê ev biryar hatibû betalkirin û biryar dabû ku tenê ji sedî 10 mûçe ji saetên zêde yên ajokaran re bê dayîn. Li gorî sendîkaya FO'yê, ji ber biryara Konseya Dewletê, ajokarên ku mehê bi dehan saetan zêde dixebitin, wê ji 300 heta hezar û 200 euroyî kêm mûçe bistînin.

Sendîkayên FO û CGT'ê, tevî ku rojên destpêkê xwe nedan ber, piştre biryar dan ku destekê bidin çalakiya 'Êlek Zer'ân a 17'ê mijdarê dest pê kir. ***PARÎS***



# DYA'yê gefa vekişandinê xwar

Piştî DYA'yê, NATO'yê jî Rûsya sûcdar kir ku li gorî peymana çeka nukleerî INF'ê ya sala 1987'an hate îmzekirin, tevnagere.

Piştî Civîna Bilind a Wezîrên Karên Derve yên NATO'yê, daxuyaniyek hate weşandin. Di daxuyaniya çapemeniyê de hate îdiakirin, Rûsya pergalên fuzeyê çêdike ku Peymana Hêza Nukleerê ya Menzîla Navîn (INF) pûç dike.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku pergala fuzeyê ya bi navê Novator 9M729 a Rûsyayê tê wateya binpêkirina INF'ê û hate îdiakirin ev pergal gefa ewlekariyê li Ewropa û Atlantîkê dixwe. Di daxuyaniyê de xwedî li gotinên serokê DYA'yê Donald Trump hate derketin, ku Trump jî bi heman rengî Rûsyayê sûcdar dike.

**Prosedurê têxin meriyetê**


Wezîrê Karên Derve yê DYA'yê Mike Pompeo jî diyar kir ku pergala ji aliyê Rûsyayê ve hatiye çêkirin, yekser gefê li Ewropayê dixwe û got ger rêveberiya Moskovê 'şaşiyên xwe qebûl neke', dê DYA di nava 60 rojan de dest bi prosedura vekişîna ji nav INF'ê bike.

Pompeo hişyarî da û got eger Rûsya gavê neavêje, bê wate ye ku DYA bi tena serê xwe li gorî peymanê tevbigere. Peymana INF'ê sala 1987'an di navbera serokê DYA'yê Ronald Reagan û Serokê Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sowyetan (SSCB) Mîhaîl Gorbaçov ve hatibû îmzekirin. ***BRUKSEL***

# Jeffrey serdana Tirkiyê dike: Koma Xebatê tê avakirin

Nûnerê Taybet ê Amerîkayê yê Sûriyeyê James Jeffrey di navbera 5-14'ê kanûnê de dê serdana Tirkiye û Urdinê bike. Hat zanîn ku Jeffrey bi taybetî dê li ser rewşa Sûriyeyê vê serdanê bike û dê li Tirkiyeyê di navbera Amerîka-Tirkiye de "Koma Xebatê ya Asta Bilind ji bo Sûriyeyê" were avakirin. Hat diyarkirin ku dê di serdanên Tirkiye û Urdinê de, Misteşarê Wezareta Derve ya Amerîkayê Joel Rayburn jî li gel Jeffrey di hevdîtinan de cih bigire.

Tê gotin ku Jeffrey danûstandinan ji bo lezdana proseya siyasî ya biryara 2254 a Neteweyên Yekbûyî (NY) pêk bîne û her wiha bi karmendên Amerîkayê yên di siyaseta Sûriyeyê de cih digirin re jî bicive. Tê payîn dê mijarên nexşerêya Minbicê û hevkariya leşkerî ya Amerîkayê bi YPG-HSDê re jî di rojeva hevdîtinan de be. ***WASHİNGTON***



# Li peravên Lîbyayê drama koçberan



Li peravên Lîbyayê herî kêm 15 koçberên din jiyana xwe ji dest da. Li gorî daxuyaniya Heyva Sor a Lîbyayê, bota ku ji bajarê Sabrathayê bi rê ket, li nêzî peravên Mîsratayê noqî avê bû. Hate ragihandin ku ji 23 koçberên di botê de bûn, herî kêm 15 kes mirine.

Li gorî daxuyaniya Heyva Sor, koçberên ji Sabrathayê bi rê ketin û sax man, piştî hewldanên 11 rojan gihîştin peravên Mîsratayê. Hate ragihandin, ji koçberên jiyana xwe ji dest dane 3 jê jin in û temamiya wan ji welatên Afrîkayê ne.

Ji sala 2011'an dema hilweşandina desthilatdariya Mûamme Kaddafî, bi milyonan mirov koç kir û berê xwe dan Îtalyayê. Bi hezaran koçber li ser rêya Îtalyayê li deryaya Spî jiyana xwe ji dest didin. Ji par û vir ve hejmara koçberên di ser Lîbyayê re tên Îtalyayê kêm bûye, lê hejmara kesên dimirin, zêde bûye. ***TRABLÛS***

# NY, ji bo lêkolînê budçeyekê vediqetîne

Komisyona Lêkolîna Komkujiyan a girêdayî Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî (NY) ji bo lêkolînkirina komkujiyên DAIŞ'ê yên li Iraqê dest bi xebatê dike.

Li gor nûçeya El Cezîreyê pisporê mafên mirovan Esed Ehmedhan ragihandiye ku dê Komisyona Lêkolînê ya Konseya Mafên Mirovan a NY'yê di sala 2019'an de dest bi xebatên lêkolînkirina komkujiyên DAIŞ'ê bike û hikûmeta Iraqê jî piştgiriya xwe ji bo vê xebatê diyar kiriye.

Hat diyarkirin ku lêkolîna li ser komkujiyên DAIŞ'ê ketiye rojeva NY'yê û dê budçeyeke bi qasî milyon dolaran ji bo encamdana vê lêkolînê were terxankirin. ***BEXDA***

www.arsivakurd.org



## Meclîs Walîyê Mêrdînî sûcdar kerd

**MÊRDÎN** - Prosesê qedexeyê tebervejîyayîşî de qezaya Nisêbînî ya Mêrdînî de keyeyê hemwelatîyo Vedat Acarî ke taxa Yenîşehîrî de bî rijîya bî. Acarî 2ê tebaxa 2017î de muracatê Qeymeqamîya Nisêbînî kerd, labelê qeymeqamî cewab nêda ci. Dima ra Acarî muracatê Walîtiya Mêrdînê kerd û ê zî cewab nêda. Tewr peynî Acarî muracatê Komeleya Ewnîyayîşê Rayapêroyî yê Meclîsî 'Ombudsman' kerd. Komele seba ke Walî cewab nêdayo ci sûcdar kerde û waşt ke mexdurîyetê Acarî bêro pêşwazîkerdiş.



# Yorukî waştî Demîrtaş bêro veradayîş

Badê ke MHME qerarê tehlîyekerdişê hemserekê HDPyî yo verên Selehattîn Demîrtaşî da, dadgerîya tirkî bi hawayêkê lez û bezî cezaya Demîrtaşî tesdîq kerde. Yorukî reaksîyon nîşan dayî tesdîqkedişê cezaye û vatî: "Tena Tirkîye nê pêroyê dinya wazena Demîrtaş serbest bibo."

20ê teşrîna peyêne de Mehkemeya Heqanê Merdiman ya Ewropa (MHME) derheqê hemserekê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yo verên Selehattîn Demîrtaşî de qerar dabî û dîyar kerdbî ke ganî Demîrtaş serbest bêro veradayene. Labelê 19. Mehkemaya Cezaya Girane ya Anqara qeraro ke derheqê Demîrtaşî de dîyabî red kerde. Yorukê Îzmîrî reaksîyon nîşan dayî tesdîqkedişê cezaye û serbes veradayîşê Demrîtaşî waştî.

Derheqê babete de Serekê Komeleya Dorme- Xoza û Kulturî yê Efesî (EFESÇED) Tekîn Karadag û cinîya ci Gullu Karadage qisey kerdî û dîyar kerdî ke ganî qeraro ke derheqê Demîrtaşî de dîyayo tepîya bêro antiş.



**'Ma do tesilî qezenc bikerî'**

Tekîn Karadag qiseykerdişê xo de ard ziwan ke HDP vengê heme bindestan o û wina va: "Tirkîye kerdî sey zindan. Do 6 mîlyon merdiman bikerî zindanê ke newe yenî viraştiş. Tena Tirkîye nê pêroyê dinya serbest veradayîşê Demîrtaşî wazena. Qerarê MHMEye qerarêko erêmende yo. Ma piştî danî no qerarî. Demîrtaş nika bi zorî yeno tepiştiş. Ma bi çimanê xo vînenê ke no welat de huqûq yene pelçiqnayîş. MHME menfîetanê xo vera goş nêdayêne vengê bindestan. Ganî elewî, yoruk, kurd, tirk, Çerkez û heme cîyayeyê Tirkîye bêrî tê het. Ganî ma şexsê Demîrtaşî de piştî bidî heme embazan. Seke Yilmaz Guneyî zî vatbî 'Ma do tesilî qezenc bikerî.' Yorukî vera zilmê osmanî yê efe û zeybekan de xo ver dayî."

**Ma bêhuqûqî qebul nêkenî**

Gullu Karadage zî daye zanayene ke hayîya yorukan proseso xira ra esto û wina domnaye: "Labelê îhtirazanê xo vera nêeşkenê vengê xo bikerî. Ez verê cû MHPyî ba. Labelê mi barbarîya înan dîye. Welat ver bi rewşa pêrodayîşî ra berdêne. Mi vîna ke HDPyî de ehlaq, ekolojî, aştî, demokrasî û hêz esto. HDP erj dano xoza. Ez tewrê domananê xo ma rayan danî HDPyî. Demîrtaş bi hawayo teberê huqûqî yeno tepiştiş. Ma bêhuqûqî qebul nêkenî. Ganî Demîrtaş zindan de nê mîyanê şar de bibo û qerarê MHME pê bêro." *ÎZMÎR*






## Cezaya Balukenî zî ame tesdîqkerdene

**16. Daîreya Ceza ya Dadgerîye cezaya 7 serrî û 6 mengî ke hetê mehkemeya cayîye ya ra bi îdîaya 'endamê organîzasyonî bîyayîşî' dîyabî parlamenterê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Amedî yo verên û endamê heyetê Îmralîyî Îdrîs Balukenî tesdîq kerde.**

**Daîreya Ceza îtîrazo ke avûkatanê Balukenî qerarê Mehkemeya Adlîye ya Dîlokî rê kerdibi girewt xo dest û qerar de wina vate: "Çalakîyê şîdetî yan zî fealîyetê ke bi vengdayîşê îdarekaranê organîzasyonê terorî mumkun nêyê ke sey fealîyetê sîyasîyî bêrê qebûlkerdene."**

**8. Mehkemeya Cezaya Girane ya Amedî 4ê Çileye de Balukenî rê sûcê 'endamê organîzasyonî bîyayîşî' ra 7 serrî û 6 mengî, sûcê 'propagandaya organîzasyonî' ra 4 serrî û 7 mengî û sûcê 'muxalefetê qanûnê kombîyayîş, numayîş û rayraşîyayîşî' ra zî 4 serrî û 7 mengî ceza dabî.** *AMED*

## Ronîştişê doza Kîbriye Evrene ewro yo



Ronîştişê yewin yê doza rojnamegere Kîbriye Evrena ke 9ê teşrîna verêne de Amed de ameybî tepiştene do ewro 5. Mehkemaya Cezaya Girane ya Amedî de bêro dîyanene.

Evrene bi sûcê 'endamê rêxistine' û 'propagandaya rêxistine' yena muhakemekerdene. Îdîanameya ke derheqê Evrene de ameya amadekerdene de 22 serrî ceza yena waştene.

Temsîlkarê Sendîkaya Rojnamegerê Tirkîye yê Amedî ra Mahmut Oral (TGS), Verfeka Platformê Rojnamegerê Cinî yê Mezopotamya Ayşe Guney û Verfekê Înîsyatîfê Rojnamegeranê Azade (ÎRA) Hakki Boltanî seba tewrbîyayîşê doze veng dayî û dîyar kerdî ke azadîya rojnamegerî çin a. Qiseykerdoxî dayî zanayene ke Evrene bi hawayo teberê huqûqî yena tepîştene û ganî bi hawayo lez serbes bêra veradayene. *AMED*

## Ma gama diyîn yê Yewîya Neteweyî erzenî



Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) weçînayîşê herêmî ra ver kewta mîyanê hewldayîşê tîfaqê partîyê kurdan. Hewldayîşê tîfaqê weçînayîşî ra ver 9 partîyê sîyasî yê kurdan yewîya ziwan pê ardî û Platformê Ziwanê Kurdî awan kerdî. HDP zî mîyanê Platformî de ca gêno. Her çiqas ke hewldayîşê tîfaqê weçînayîşî bibî zî heta nika ti gamêk nêameybî eştiş. Parlamenterê HDPyî yê Amedî Îmam Taşçierî derheqê babete de qisey kerd.

Taşçierî wina va: "Şarê kurd bi serran o seba yewîya neteweyî têkoşîn dano. Ganî kurdî çar paçe de yewîya xo awan bikerî. Xebatê ma resayî merheleyêka gird. Kurdistan de tewimîyayîşê muhîm virazîyenî. Ganî partîyê sîyasî û komeleyê sivîl yewî rê serkêşî bikerî. Ganî ma weçînayîş de yewîya xo awan bikerî. Ma gama diyîn yê Yewîya Neteweyî erzenî." *AMED*

## Qayûm taxe mîyanê çamure de vera da

Qezaya Cizîrî ya Şirnexi de wextê qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan ra dima şaredarî taxa cudî ke zirar dîbî de kuçeyê Gulene kerrayê parke kerdbî.

La şaredarîya ke qayûm tayînê aye amebi kerdene bi mehneya do asfalt bêro kerdene kerayê parke wedarnaye. Kerrayê parke aşmêk verê cû ameyi wedartene û herinda înan nêameyî asfaltkerdene.

Wexto ke varan vareno û beno şilî kuçe mîyanê çamure de manena û hemwelatî wexto ke kuçe ra derbaz benê dêsan tepişenî û bi no hawa derbaz benê.

Hemwelatîyêke xebatê ke qayûm keno sey îşkence biname kerde û wina va: "Qayûm ma perîşan kerdo. Vatî ma do asfalt bikerê û kerrayê parke wedarnayî. La cayê ke yenê asfaltkerdiş dûrê tîya yî. Eke wina bi çira kerrayan wedarnayî? Bi aşmêk ma nê ezîyetî ancenê. Ma do menga çile de se bikerê? Seba na çamure wesayîtî zî nêeşkenî derbaz bibî. Domanî zî nêeşkenê vejîyê teber." *ŞIRNEX*





## Rewşa hepsîyo nêşew xidar bena

Hepsîyo bi nameyê Fuat Yavuzelo (23) ke 6ê temmuza 2017î de qezaya Pirsusî ya Riha de serê îxbarêk amebi tepiştiş bi îdîaya 'endamîyê rêxistine' ame tewqîfkerdiş.

Yavuzelî de nêweşîya Îmmun Trombositopenik Purpure (ÎTP) ci de esto û her ke şono rewşa ci xidar beno. Avûkatê Yavuzelî, Firat Şahînî dîyar kerd ke dosyayê muwekkîlê ci de ti delîlêk çin o û her mehkema de ê doza serbest veradayîşê Yavuzelî kenî, labelê 4 ronîştişo ke waştişê înan yeno redkerdene. *RIHA*

## Mîks de darê 200 serrî yê gozan ameyi birnayene

Qezaya Mîksî ya Wanî bi rindîya xozaya xo, cografyaya keske, zimistanê derg û dilayan û varayîşê vewrêka zêde yena naskerdene. Hema hema nêmîya serîyêk qeza binê vewre de ya. Qeza mabenê şarî de sewbîna bi nameyêk 'gezegeno 9.' yena binamekerdene. Na qezaya ke parçeyêka cennetîya nê rojan de bi qirkerdişê xozaye rojeve de ya.

Goreyê malumatê ke ameyi herînayene, qayûmo ke tayînê şaredarîya Partîya Herêmê Demokratîkî (DBP) ameyo kerdene 60 darê gozan ke emrê înan dormeyê 200 serrî de yo bêpawitiş vera dayo û ameyi birnayene. Hemwelatîyê ke Gundikê Şaxa de manenî dayî zanayene ke tay hemwelatîyî bê destûr daran birnayî. Hemwelatîyî wina vatî: "Darê gozan seba ke kok ra ameyî birnayene mumkun nîyo ke newe ra zergun bibî. Tay merdimî no gure xo rê kerdî sey meslek û timî daran birnenî. Qayûm ra ver şaredarî daran pawitêne. Qayûê xoza talan keno." *WAN*



www.arsivakurdi.org

# Bi dengê tepsiya şêx rêya derwêşiyê jê re vedibe

*Derwêş Sofî Kemal heta roja ku dibe mirîd û rêya derwêşiyê li ber vedibe jî diçe ber sewalan. Rojek dema ku şêxek tê gundê wan, xwe li dengê tepsiya ku şêx lê dide digire û êdî naçe ber sewalan*

Kadrî ESEN / AMED

Di wêjeya kurdî de gelek cureyên wêjeya devkî hene û piraniya van cureyan bi meqam in. Yek ji van cureyan jî derwêşî ye. Ev cure piştî qebûlkirina ola îslamê di nav civaka kurd de peyda bûye û bi pêş ketiye. Çawa ku dengbêjê her mîrê kurd hebûye û bi awayekî devkî li ser mîrê xwe kilam gotine, wisa derwêşê her şêxê kurd jî hebûye û bi awayekî devkî li ser şêxê xwe beyt û qesîde gotine. Derwêşan beyt û qesîdeyên ku li ser şêxê xwe derxistine, li her civaka ku şêxê wan çiyê bi meqam gotine û pesnê şêxê xwe dane.

Di salên dawî de ji ber ku piraniya şêxên li Kurdistanê ketine bin kontrola dewletê û çanda dewreşiyê ya civaka kurd guhertine û li gorî daxwazên dewletê teşe dane derwêşiyê. Di serî de jî zimanê derwêşan guhertine. Wek mînak beyt û qesîdeyên ku derwêşan berê bi zimanê kurdî distra niha ji holê rakirine, li şûna wan beyt û qesîdeyên bi erebî û tirkî bi derwêşan dane jiberkirin. Li gel vê yekê hîn jî derwêşên ku ji ya xwe nehatine xwarê û bi zimanê kurdî beyt û qesîdeyan distrên hene. Yek ji van derwêşan jî Derwêş Sofî Kemal e.

Sofî Kemal sala 1960'î li gundê Çirikê yê navçeya Farqîn a Amedê ji dayik bûye û hê jî li heman gundî dijî. Me jî xwe li gund Çirikê gihand Sofî Kemal û çîroka derwêşiya wî jê guhdar kir. Sofî Kemal zarokatî û ciwaniya wî li ber sewalan derbas bûye û heta roja ku gihîştiye şêxê xwe û dest bi derwêşiyê kiriye jî li ber sewalan bûye. Sofî Kemal di sala 1982'an de dest bi derwêşiyê dike û heta salên 2000'î nêzî 20 salan bênavber bi şêxê xwe re digere û derwêşiya wî dike.

**Çîroka destpêkirina derwêşiyê**

Sofî Kemal bi van gotinan dest bi çîroka xwe ya derwêşiyê kir: "Rojek şêxê bi navê Salih (Şêx Salih kurê Şêx Ezedînê nebiyê Şêx Remezan e û ji gundê Êdo yê navçeya Mehsertê ya Mêrdînê ye) hate gundê me. Ew roj ez li ber sewalan bûm. Carekê min dît dengê lêdana tepsiyan ji gundê me tê. Min jî li ser vê yekê berê xwe da nav gund û ji miletê pirsî ku ev çi ye? Heta wê demê jî min tiştên wiha nedîtibû. Milletê ji min re got ku şêx hatiye beyta dibêjin. Ev yek li xweşa min çû û ez beşdarî wan bûm. Ji ew roj şûn de ez jî gihîştim Şêx Salih û bûm mirîdê wî."

**Hemû beyt û qesîde jiber in**

Sofî Kemal diyar kir ku piştî bûye mirîd bi ferman şêxê xwe li cem mirîdekî bi navê Hecî Ûsiv hînê lêdana erbanê bûye û wiha dirêjî da çîroka xwe: "Min dersên xwe yên ji bo hînbûna erbaneyê her rojên êvara înê (pêncşem) digirt. Di nav demê de ez hînê lêdana erbanê bûm. Piştî hînbûna lêdana erbanê, ez bi şêxê xwe re gund bi gundên li Kurdistanê li nav mirîdan digeriyam. Her carekê ku em derdiketin gera nav mirîdan meha me zêdetir diqediya. Min bi şêx re li erbaneyê dixist. Bi lêdana erbaneyê re hînê strandina beyt û qesîdeyan jî bûm."

Sofî Kemal da zanîn ku bê perwerde hînê strandina beyt û qesîdeyan bûye û wiha got: "Beyt û qesîdeyên li cem min dihatin gotin min wek teyîbê di mejiyê xwe de qeyd dikirin. Hemû beyt û qesîdeyên ku ez dibêjim min bi rêbaza jiberkirinê hîn kirine. Rojek jî min perwerdeya vê yekê negirtiye. Beyt û qesîdeyên ku ez dibêjim hebek jî li cem min nivîskî tune ye. Hemû di mejiyê min de jiber in. Bi dehan beyt û qesîdeyan dizanim." Sofî Kemal destnîşan kir ku strandina beyt û qesîdeyan hêsan nîne û got ku heta eşqa strandinê neyê mirov nikare beyt û qesîdeyan bistrîne."

Sofî Kemal qala naveroka beyt û qesîdeyên ku dibêje jî kir û ev tişt anî ziman: "Beyt û qesîdeyên ku ez dibêjim di piraniya wan de qala şert û mercên jiyana pêxemberan û pesêndayîna şêx û terîqeta me tê kirin. Nayê zanîn ku beyt û qesîdeyên me ji aliyê kê ve hatine çêkirin. Hemû jî anaonîm in û hatine jiberkirin." Sofî Kemal ku ji derwêşiya xwe bawer e got ku ew beyt û qesîdeyên xwe bi bandor distrîne û gelek caran guhdarvanên xwe li beyt û qesîdeyên xwe bi girînî dixist.

**Ji şêxê xwe vediqete**

Piştî salên dûr û dirêj Sofî Kemal ji şêxê xwe vediqete û bi van gotinan qala sedema veqetandina xwe kir: "Dema ku ez bi şêx re bûm debara min nedibû. Zarokên min gelek rojên zor û zehmet derbas kirin. Ji bo ku karibim debara xwe bikim ji şêx veqetiyam û hatim mala xwe. Lê min tu demê dev ji strandina beyt û qesîdeyan bernedaye. Hê jî dema ku li gund û herêma me civak çidibin ez di van civakan de bi elbanê beyt û qesîdeyan dibêjim."

Beyteke ku Sofî Kemal distrê û têde bêyî ku navê wî bê dayîn hesreta şêxê wan ê Êdo tê ziman û pesnê wî tê dayîn wiha ye;

*Tu kamilî tu kamilî*
*Şêxê Êdo tu kamilî*
*Ji nûra Muhemed hamilî*
*W'eman hebîbê kamilî*
*Lo kamilo li kemaletê*
*Bextê te me li qiyametê*
*Şêxê Êdo tu min bi bîr nekî*
*Li qiyametê di rê de me bikî*
*Çi şêxekî pir delal e*
*Qelbê şêx ji nûra delal e*
*Şêx li Êdo mecal e*
*Li nav mirîda bayreqdar e*
*Ji qelbê xafil şêx neyar e*
*Şêx zakîr ba wa bê celal e*
*Eman hecî tu kamilî*
*Ji nûra Muhamed hamilî*
*Tekya şêxê min çi bilind e*
*Têd vêketin mûm û find e*
*Ewa te wa di qelpê min de*
*Şêxê Êdo tu kamilî*
*Tu kamilî bi kemaletê*
*Tod li te me qiyametê*
*Çû'm tekyayê bi mijd û nûr e*
*Çû'm wefayê bi mijd û nûr e*
*Yek elban e û yek jî şûr e*
*Yek elban e û yek jî şûr e*
*Çi bikim hecî ji me dûr e*
*Çi bikim kalo ji me dûr e*
*Exlê te ema ewe li qebra kûr e*
*Şêxê Êdo tu me ji bîr nekî*
*Tu bi îlahî rica me bikî*
*Cem pêxember me ji bîr nekî*



# Mem Ararat û Kerem Sevînç konser li dar xist

Mordem Huner a beriya bi demekê li Amedê bi armanca xebatên çand û hunerî hat vekirin, konserek ya hunermend Mem Ararat û Kerîm Sevînç li dar xist. Gelek hezkiriyên muzîka kurdî beşdarî konserê bûn.

Di destpêka konserê de yek ji xebatkarên Mordem Hunerê Kenan Demîr axivî û behsa mebesta konserê kir û got ku ew xebatên çand û hunera kurdî bi rê ve dibin. Demîr ji bo xwedîderketina çand û hunera kurdî xwest hemû kes li zimanê dayika xwe xwedî derkeve û diyar kir ku dê di siberojê de hin xebatên berfirehtir ên çand û hunerî li dar bixin.

***'Em li zimanê xwe xwedî derkevin'***

Konserê bi stranên zîz ên Mem Ararat dest pê kir. Ararat beriya ku dest bi strandina stranên xwe bike axaftinek kurt kir. Ararat di axaftina xwe de bal kişand ser pêvajoya kurd tê de derbas dibin û xwest li gel pêvajoyeke ewqas dijwar jî gelê kurd li zimanê dayika xwe xwedî derdikevin. Ararat da zanîn ku dê kurd bi xwedîderketina zimanê xwe çand û hunera xwe jî azad bikin. Ararat paşê jî stranên xwe strandin û muzîkhezan li ber dengê tembûra xwe xemgîn û kêfxweş kirin.



Piştî Ararat hunermend Kerem Sevînç ê bi zaravayê kirmanckî ku distre jî derket ser dikê û stranên kirmanckî gotin. Olana dengê stran û awazên kirmanckî li salonê deng veda. Piştî strandina Kerem Sevînç konser bi dawî bû. *AMED*

ASOYA HUNERÊ

Xelîl XEMGÎN



# Mikurhatin dilsozî ye

Di hoyên taristanî yên Rojhilata Navîn de di nava qîlên cîhanek durûtî, berjewendperest û bê edalet de; ji neteweyeke perçe perçe, ji civakek li ber xirqên mirinê ku bi her cureyan pê hatî lîskandin, jinûvevejiyandin û hêvîdarkirin, mîna vegerandina miriyekî li jiyanê ye.

Ne karekî hêsan e. Bi temamî destan û efsûneyek e, bûye û dibe dîroka mirovahiyê. 40 sal e "Destarê vejîna jiyana nû" bi hemû zexmiya xwe bê rawestandin digere û berdewame.

Tu qeyd, bend û kelem nikarin xwe li ber rastiya vê felsefeya ku Rêber Apo afirandî ragirin. 40 sal e ji kîjan qonaxê heya ku derê!

✓ Bi civakî û bi neteweyî êdî me daye ser şopa venegerê!

✓ 40 sal e tilsim û şîfreyên Ronesansê di ayetên vê felsefeyê de veşartîne.

✓ Nêrînên ji derve çi dibin bila bibin, a pêwîst cewhera dînamîka hundirîn e.

Giranî û gewhera paradîgmaya Ocalan afirandiye, ji bo hemû gelan û civakan weke hêvî û Ronesansa serdemê tê pejirandin. Rexneya Ocalan ( ...hêza we ya têgihîştin û fêmkirinê lewaz e, hûn min seranser fêm nakin, fêm bikin jî êdî derengmayî û fersendan ji dest direvînin) li tevger û civaka kurd dikir, îroj em dibînin ji derve de jî heman rexne ji aliyê rewşenbîr û zanyarên navneteweyî û herêmî ve tê piştrastkirin. Hem bi civakî hem jî bi rêxistinî hin teybetmendiyên me yên hişmendiyê, her demê bûne kelem li ber pêşketin û destkeftiyan.

Bê şik û guman im ku di van 40 salên borî de destkeftî û nirxên vê tevgerê afirandine, hem yekane ne û hem jî mucîzeyên sedsalê ne. Belkî hin kes vê yekê mubalexe bibînin lê mirov dikare mînakên van mucîzeyan bi serfirazî bibêje; di vê serdema ku hemû hêz û dewlet bi polîtîkayên şer û cengê ve mijûl in, bira ketiye pêsîra birayê xwe, ma karê kîjan Egîdan e ku bi çareseriya biratiya gelan bang bikin?

5 hezar sal dîroka koledariya jinê di serdema moderniteya kapîtalist de ku jin kirî xam-madeya sermayeya herî bingehîn. Vejîna jina serbilind û dengvedana berxwedana jina kurd ne mucîze ye ma çî ye! Bi baweriya min di dirêjiya salên tekoşînê de îro êdî zelaliya dihat hêvîkirin ji nava refên şoreşê heta xebatkar û kedkaran, ji dilxwaz û welatparêzan heta dost û alîgiran, du tîpên hişmendiyê derketine holê.

Tîpa yekemîn ji her milî de xwe bi felsefe û bîrdoziya Tevgera Azadiyê têr û tije xwedî dike, xwe mazûvan û xwediyê malê hîs dike û bi berpirsiyarî, wijdanî û exlaqî tevdigere. Tîpa duyemîn jî (Bi teybetî di van salên dawiyê de ev tîp zêde bûye) ji afirandinê bêhtir, çav li tiştên hazir e, gazinc û bendewariyan dike. Her demê dixwaze Tevgera Azadiyê veguhêze ser şêwaza xwe û xwe ji xwediyê malê bêhtir wek mêhvan û hukumdar dibîne.

Bêguman tespîtên me destnîşan kirine di her qadê de tên dîtin. Bê şik e ku para her yekê ji me di van kêmasî û netêrbûnan de heye. Her wiha bi sedema salvegera vejînê ji bo her kesekî wefadarî û erdemî ye ku mirov xwe ji kêmasî û netêrbûnê rizgar bike, hêvî û baweriyên xwe û derdora xwe xurt û qewîm bike. Em weke civak, welatparêz, ciwan, jin û ronakbîr xwe nêzî daxwaz û armancên Rêber Apo bikin û li xwe mikur bên ku ev dilsozî û dilpakî ye.

www.arsivakurdi.org